

Kurdpa di 11 saliya xwe de
şanaziyên nû diafirîne

»»» R:7



Sala nû û pilatform
bo xebatê

»»» R:3

Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duhestînameyek Siyayî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (413) 06-01-2022 Buha (1000) Tûmen

Meydayên Farsî ziman ên
li derveyê Îranê û zêdekirina
faşîzma Îranî

»»» R:4

Înternet û Aborî

»»» R:6

Mamoştaya xwendigehê kevte girtîgehê

Di rêkevta 12ê Be-
franbarê de hate
pişraştîkirin ku cezayê
narewaya sepandina 5
sal girtîgeha teizîrî bi
ser çalakvana çandî ya
Kurd “Zara Mihemedî”
li ser torên civakî
de hate belavkirin û
hogirên ziman û nas-
nameya netewîya Kurd
tevî xembarbûna wan
bo sepandina wê cezayê
narewa, bi şêwazên cur
bi cur dane xuya û li
hember rawestiyane
û piştevaniya xwe li
mamoştaya “Zara Mi-
hemedî” ku bê hebûna
ti tawanenkê dêxin
kuncê girtîgehê dane
xuya.

Xuya ye ku ew yekem
car nîne ku cezayên
wiha li ser çalakvanên
Kurd de disepînin û
hevdem digel navbirî
kesên din jî hene ku
di vî awayî çalakiyan
dikin, lê di dîtingeha
koloniyalîstiya rejîma
Tehranê de, ew bûne
gef li ser herifan-
dina deşthilata siyasî!
Kesên wek lêkoler,
wergêr, jenyar û
çalakvana çandî ya
xelkê “Kelardesta
Mazenderanê “Mu-
jgan Kawûsî û çal-
akvanê çandîya Kurd
Mehmûd Nîrûmend”
li Xurasanê ku di bin
îşkenceyên Komara
Îslamî û di girtîgehên
wê rejîmê de xwe



kirine gorî ku bikarin xizmetkarê Kurd û zimanê Kurdî bin.

Pirsyara sereke di vê navberê de divê îşareyek cidî lê bê kirin ev e ku bi rastî çi tiştek wisa dike Komara Îslamî wiha hovane li dijî kesên ku ne bi awayê tundûtîjî belkî bi sedema wanegotinên zimanê Kurdî û hewldan bo parastina nasnameya netewîya xwe şer dîkin, bikevin ber kîn û kerban û hukmê narewa û girtîgehê li ser wan de bê sepanandin?

Li deşthilatek Koloniyalîstî ya wek Komara Îslamî ya Îranê, siyaseta bingeîn û ya ku bi rê ve diçe înkarkirina netewan û jinavbirina cudatîyan li xwe digre, lewma deşthilat li derheq asmîlekirina ziman û kultûra netewên cuda hatiye avakirin û her cure hewlek bo zîndîragirtina zimanê netewên jêrdeşt bi jinavçûna deşthilata xwe dizanin; lewma hewlên “Zarayan, Mujgan, Mehmûdan û bi dehan û sedanên din” ku bi vî awayî dixwazin zimanê zikmakî biparêzin û bi dujmînê xwe dibînin.

Girtin û binçavkirina çalakvanên warê ziman û çanda Kurdî, beşek li wê tirajêdiyê ye ku bi ser netewa Kurd û netewên din ên li Îranê de tê sepanandin û eger em kêmekê jî bi hûrî mêzeyê wan bikin ev tirajêdî ti kêmtir ji trajêdiyên wek jênosayd û hewil bo qirkirinên fîzîkiya Kurdan nebin.

Bi kurtî pirsê binçavkirin û sepanandina ceza bi ser mamoştaya “Zara”yê de dengvedan û bertekên cur bi cur li pey xwe anî bo mînak; daxuyaniya Yekîtiya Zanayên Olî yên Kurdistanê Îranê ku bi rohnî gotibûn: “Zara Mihemedî ew keça dilsoz û netirs e ku bi tenê bi tawana wanegotinên zimanê Kurdî, cezayê 5 sal girtîgeha teizîrî bi ser de hatiye sepanandin. Ew zulma li dijî mirov bi ti şêwazakî di dîtingeha Ola Îslamê û biryarên carnameya mafê mirov de nayê qebûlîkirin, lewma erkê Olî yê tev azadixwazan û gelê Kurd e ku li dijî wê cezayê nemirovane rawestînin û li beranber bê dadperwerî û wê bîrêziyê bisekinin, çimkî îro “Zara” bi tenê yek kes nîne belkî dayîk, xwîşk û keça hemû Kurdên Rojhilatê û şerefa her Kurdekê ye ku rejîm li dijî Kurdên Kurdistanê Îranê mijûl e bînpê dike! Em daxwaz dikin di beranber wê cezayê de bîdeng nemînin û hemû bibin bi Zara Mihemedî û şeref û nampûsa Kurdistanê biparêzin”. Eva derxerê wê rastiyê ye ku Komara Îslamî wek sereketirîn dujminê me yê Kurd hemû hewil û şiyana xwe dide ku bi her awayekî be Kurdan ji nasnameya xwe ya rastî bimehînin; Çimkî di-zane ku ziman ev çeka bihêz e ku rê ji wê amancê digire, bi her nirxekî be hewila jinavbirina wê dide.

Sergotar

Qasimê peritî

N: Kerîm Perwîzî

Qasim peyevêk Erebi ye û bi wateya kesek ku pareve dike an bi wateya dabeşker tê. Bi vî awayî Qasim kesek e ku bo parvekirin hatiye diyarîkirin û erkê xwe li dabeşkirina berdewam de dibîne.

Qasimê Xamineyî jî ku gelek li ber dilan bû û Xamineyî bo mirina wî gelek giriya û jî nû ve jî biriyar daye her kes di ragihandinan de behsa xirabîya wî bike, îdam bikin; Ew kesek bû ku bi navê paraştina “herema îmamzadeyan” di navçeyên Rojhilatê de mijûlê belavkirina tundûtîjî û fitinegerî û kuştare bû.

Qasim Silêmanî, Fermandeyê Spaha Quds a rejîma koloniyalîstî ya Tehranê bû ku taybet ji bo kiryarên terorîstî û kuştar di derveyê sînorên Îranê de hatibû diyarîkirin, lê hin caran jî ku Spaha Pasdaran li navxweyê Îranê ber bi lawaziyê ve diçû, Qasim û Spaha terorîst a wî dianîne navxweyê Îranê bo serkutkirina xelkê; mînakên wê mijarê jî ev in: Beşdariya Hizbullah Lubnanê bo serkutkirina xwenîşanderan li Tehran û bajarên mezin ên Îranê, beşdariya milîşên Îraqî yên ser bi Îranê bo serkuta xwenîşanderên Ehwezê û herwisa pêka hin nûçeyan beşdariya Qasim Silêmanî li şerê “Kosalan”ê li dijî pêşmergeyê PDKÎ.

Qasim ku du sal berî niha li 3`ê “January”ê, li balafirxaneyê Bexdayê hate parçe-parçekirin; Berî wê ku bê kuştin, karê wî eva bû ku girûpên cuda heta di nav Şî`eyên Îraqê de jî diruşt bike û berde canê yektir û bo her cihekî diçû karê wî tenê kuştin û berdana yektir bû û li Sûriyê jî êdî rûyê “Hîtler” sipî û sipîtir kiribû!

Piştî parçe-perçebûna xwedê Qasim bi raketên Amerîkayê,

Şandeke Partiya Maf û Azadiyan (HAK-PAR)ê serdana Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê kir



Roja Duşemî rêkavta 13`ê Befranbara 1400`an, şandeke Partiya Maf û Azadiyan (HAK-PAR) a li Kurdistanê Turkiyê bi serpereştiya “Letîf Epözdemir”, Serokê Giştî yê “HAK-PAR”, serdana PDKÎ kir û ji aliyê heyeteke Hizbê ve bi serpereştiya “Mîstefa Hicrî”, Lêprsyarê Giştî yê Partiya Demokrat pêşwazî li wan hat kirin.

Di vê hevdîtinê de, rewşa Kurdistanê “Bakur û Rojhilat” û herwisa rewşa “Îran û Turkiye” hatin nîqaşkirin. Her yek ji wan ji dîtingeha siyasî û helwêstên xwe, çawanîya ber bi pêşveçûna tevgera neteweya demokratîk a Kurd di her yek ji beşên Kurdistanê de anîn ber bas.

Di vê hevdîtinê de, herdu aliyên li gor rewş û arîşeyên hevpar yê siyasî ên niha yê wan welatan ku Kurdistan bi ser de hatiye parvekirin, rewşa navçeyê, hewcehiya yekgotarbûn û yekrêziya hêz û aliyên siyasî yê xwe wekî erkeke hewce dane zanîn.

Di dawiyê de, herdu aliyên li ser bihêztirkirina pêwendiyên dostane yê di navbera wan de tekez kirin.

wisa tê xuya ku rola perçekariyên “Qasim” Silêmanî tevahî nîne!

Piştî du sal asûdeyiya deverê bi destê terorîstê mezin yê wek Qasimê peritî, niha perçeyên wî her di warê derûnî de bandorê dadinê û em dibînin ku binav kesên siyasî çawa bi bejin û balê perçeyên Qasim ve diçin ku dîrok jî hilgirê wê yekê nîne!

Yên ku wê karê dikin dúbare heman rêya Qasim Silêmanî didomînin ku ev jî dabeşkirin, cudakirina xelkê ji yektir û fitneafirandin di nav xelkê de ye!

Qasim Silêmanî karek wisa nekiribû ku xelk dilê wan pê xweş be û evqas tawan li Îran, Îraq, Sûriye, Lubnan û Yemenê afirandîye ku her mehtkirineke wî, bi xwe birîna dehan û sedan kesê zêdetir nû dike. Mehtkirina Qasim Silêmanî hemû ew azarên sedan hezar avare û malbatên kuştîyên Sûrî car din nû dike. Bi hezaran kes di Rojhilatê Kurdistanê de birîndar dike û dúbare dijayetiya xelkê li dijî wan kesên ku mehta wî dikin nû dike û tîjtir dike.

Qazancên Qasim Silêmanî tenê bo Xamineyî hebû, çimkî wen herdukan nexweşiya derûnî hebû û wan hez ji fitne û xwînrijandinê dikir û Xamineyî wisa dizanî ku tenê bi şer û fitne, desthilata wî berdewam dibe, lê bo hemû xelkê din û heta bo xelkê Îranê û bo Farsan li Îranê jî nîşaneyên malwêranî û teror û kuştare bû. Ti wîjdanek hişiyar, heta bi qasî dilopelê jî dilê wê/wî bo Qasim Silêmanî lê nade û eva Komara Îslamî ye ku dixwaze ji wî tawanbarê dîrokî, qehrimanekî di-

Sala nû û pilatform bo xebatê



N: Nûredîn Sofîzade

Sala derbasbûyî an ku 2021`an jî, di Îrana jêr deshilata rejîma Îslamî de, her wekî salên derbasbûyî xelkê belalêdayî yê Îranê bi giştî, para wan rojreşî bû.

Xelkê welatê me saya serê wê rejîmê û siyasetên çepel ên wê, rastî jiyanek herî dijwar bûne. Bêkarî, bêdahatî, pîrçîtî û nedarî para herî zêde ya xelkê bû; ev yeka jî bû bi sedem ku dehan diyardeyên civakî di nava civatgeha Îranê de serî hildin, ên wekî dizî, gendelî, xwekujî, leşfiroşî, parskirin û geriyana di nava zibildanan ji bona peydakirina tiştêkê ku bête xwarin, zêdebûna amara telaq û gelek diyardeyên din.

Zêdebarê wê rewşa pirjan ku bi hegera siyaseta bi zanabûn a rejîmê ku dixwaze li vê yekê xirabtir jî bi serê xelkê de bê, ji aliyekî din ve jî, tepeserî, girtin, kuştin, îşkence û îdam, gazîkirin, sepandina cezayê giran bi ser xebatkarên siyasî, medenî, sinfî, û yên din de, ji aliyê rejîmê ve berdewam bûye û bi awayekî herî hovane cehda fetisandina her dengekî mafxwazane daye.

Dema ku em dêna xwe didine rewşa welatê xwe û xelkê jêrdeşt yê Îranê, dema ku hemî xelk dizane ku çi hêviyek bo jiyanê nemaye, dema ku kesayetî û keramet û jiyan û asûdeyî bo xelkê nemaye û sebebkarê sereke yê çêkirina wê rewşê jî rejîma Komara Îslamî ye, divê çi bê encamdan da ku carekî din xelk vegere ser jiyanek serbilindane û bibe xwediyê kerameta xwe û dût be ji sîstema dîktatorî û kevneparêzî ya Axûndî?

Raşt e di sala 2021`an de jî, wekî salên berê, xebat û



serhildan û nerizayetî hebûye li hember wê rejîmê, renga qasê nerizayetiyan û rêkxistinîbûna wan û xebata di sala 2021`an de, ji ya salên berê rijdtir be jî, lê bêguman hekî ev xebat bi armanca xelasbûna ji deşt wê hemî rojreşiyê be, hekî bi armanca sernixûniya wê rejîma dîktator be, renga têrê neke, û divê mîkanîzm û metodên xebatê hêj çêtir bêne rêkxistin.

Kêmasiya herî berçav bona bigurtir kirina xebata li dijî wê rejîmê, nebûna altirnatîvekî bihêze ku bikare li astê seranserî de hêla xebatê xuya biket û xelk jî pê piştqahîm be, ev altrinatîv an ku rêberiya divê bikare nerizayetiyan rêkxistinî bike û nerizayetiyan qat û sinfên cuda cuda yê di nav Îranê bike yek nerizayetiya seranserî, çimkû di derbasbûyî de gelek bi başî xûya bû ku her kîjan ji wan sinfan ku deşt kirine bi nerizayetiyan, mixabin nekarîn bibin sedema rakêşana sinfên dinê bo meydana nerizayetiye û nekarîn piştevaniya seranserî devra xwe kom bikin.

Bo mînak, nerizayetiya mamostayan, pereştaran, kirêkaran, maltorandiyan, xanenişînan, ajotvanan û yên din.

Yan me dît ku hekî xelkê belengaz û bin deşt yê Ereba ên Herêma Ehwezê, nerizayetî li hember bê aviyê nîşandan, mixabin tu netewe û navçeyekî Îranê jê xwedî dernekevtin, heta ku rejîmê bi awayê herî hovane, xwenîşandan û nerizayetiya wan tepeser kir.

Bi kurtî sedema bihêz nebûna serhildan û nerizayetiyan di Îranê de, tenê nebûna yekdengiya seranserî di nav Sinf û qatên cuda û netewên bê maf de ye.

Lewra rejîmê jî bi başî seh bi wê kêmasiyê kiriye û bo xwe derfet dizane daku her serhildan û nerizayetiyekî tepeser bike.

Hekî em behsa opozisyona seranserî jî bikin, mixabin çendîn girûp û aliyên siyasî ku xwe dijber û altirnatîvê pêşeroja Îranê dizanin, li ber vê yekê ku wan jî di navbera xwe de tu hevahengî û alîkarî û pilatformekî xebatê tunînin, lewma wan nekarîne bibin xwediyê pêgeh û rola rêberiyê di nav xelkê Îranê de ji xwe bidine kifşê û peyda bikin, parekî bêhêvîtiya xelkê li navxweyê Îranê de û bê bernameyî û nerêkxistinî bûna nerizayetî û xwenîşandanan û xebata li dijî rejîmê, vedigere bo wê yekê ku xelk tu rêberiyekê pişt serê xwe nabîne da ku pê dilgerm bibe.

Rewşa xebata netewên bêmaf yê Îranê wekî Kurd, Ereba, Belûç, Azerî, Turkemen an jî, ji ber girêdayî bûna xebata netewî, tenê mirov dikare bêje, xebata navçeyî ye li her kîjan ji mêhwera xebata wan netewane ve.

Kêma û zêde renga xebata wan netewane gorekî xebata rêkxistinî siyasiya wan netewane, li navçên wan xwe de gorekî xebata seranserî ya Îranê, baştir û rêkxistinîtir be lê, bêguma ev jî bê kêmasî

nine.

Piraniya netewên bêmaf ên Îranê daxwaza mafê çarenivîsa xwe dikin, ji ber vê yekê ku her kîjan ji wan netewane dîrokekî dût û dirêje xebata netewî hebûne û xwediyê rêkxistin û partên siyasîne, heta nasyonalîstî û yekitiya netewî di nava wan netewan û navçeyên wan de bihêz e. Kêmasiya herî berçav di xebata wan neteweyan de jî, nebûna alîkarî û hevxebeatiya wane, bêguman dema part û aliyên siyasî yê wan neteweyan digel hevdu hevxebeati hebin û pîlan û bernamên hevpar hebin bo xebata bi dijî rejîmê, şik di wê yekê de namîne ku ew netewan di navxweya Îranê de jî piştewaniya hevdu bikin. Dema yek gotarî di navbera rêberiya bizava wan netewane de hebe û karê hevpar bikin, bêguman hekî li Ehwezê xwenîşandan bête kirin, dê Kurdiştan, Belûçîstan, Azerbaycan û Turkimensehra jî, piştewani bikin, yan bi berewajî li navçeyekî din de. Ewa rêberî û opozisyona wan netewaneyê ku dikare bi wî awayî xebatê bi hêz bike, dema ku ew netewane bûne hevmeram û hevxebeati, bêguman dikarin wekî hêzekî xwedî bandor û yekdeng, li astê seranserî ya Îranê de jî rol bilîzin û bandorê dabinête li ser opozisyona xeyrî wan neteweyan.

Kite rêka serkevtina xebatê bi ser dîktatoriya deshilatdar li Îranê de, tenê û tenê, yekiti û hevxebeatiye.

Hêvî dikim ku sala nû anku 2022`an bibe deştpeka heştîkirin bi wan kêmasiyan, û bibe deştpeka lêdana şarta hevxebeati û yekrêziya di nava xelkê rojreşe Îranê û neteweyên blindeşt yê Îranê û part û aliyên xebatkar, da ku kela zordarî û dîktatoriya wê rejîmê hinî zû bête herifandin.

Rejîma Îranê tenê divê bi deştê xelkê Îranê bê sernixûnkirin, ne ewa ku benda welat û aliyek û munciyekî derekî bin.

Meydayên Farsî ziman ên li derveyê Îranê û zêdekirina faşîzma Îranî



N: Mardîn Rehîmnîjad

W: Hesen Mukerem

Faşîzma “Fars”, ji wan kesan re tê gotin ku bi sedema serdestbûna neteweya Fars û berjewendiyên wê li hember mafê neteweyên din ên Îranê çavên xwe digirn. Çi ev mirova xwediye hizir û ramana olî be, çi xwediye hizir û ramana paşayetiye be, çi xwediye hizira lîbralan jî marîksîzîmê be. Dema ku di nav hinavên xwe de piştevaniye li zilm, zor, enflasyon û tawanên rejîma Îslamî bike, hevparê wan tawanane ye ku derheq bi neteweya tepeserkirî de tê encamdan. Heta “Komara Îslamî” bixwe jî, yek ji berhemanînen faşîzma Fars e.

Medyayên derve yên farsan weke Zîha (Êjdha) yek çend sere çendîn rolan dilîze, û gelek bi zîrekî ve mijûl e ku Komara Îslamî di nav xeleka neteweyên Îranê de dixîne derê û neteweya Îranê û faşîzma Fars li Komara Îslamî cuda dike û herwisa dixwaze neteweya çekirî ya Îranê (Fars) bi serkevtî bihêle. Di demekê de ku Komara Îslamî bixwe berhama hemen faşîzmê ye ku di qonaxekê de, metirsiya nemana qebareya Îranê li gorê bû. Wan berevajiyê neteweya Kurd her ku arîşeyeke aborî an jî civakî çê dibe bicihê ku êrîşî li ser desthilateke diyarîkirî bikin, yekser êrîşî li ser hikûmeta Kurdî dikin. Ev gelek bi jêrî û hişyarî erkê mehandina neteweyên Îranê bi rê ve dibin û neteweya Îranê li Komara Îslamî cuda dikin.

Medayên derve yên Fars ziman mejûlê amadekirina mejiyek wek neteweya nefars in bo domandina rewşa kol-



onyalîzmê bo piştî hilûşîna Komara Îslamî. Mejûl in di xeleka vê teoriyê de şerê hizirî çê dikin ku di encama serkeftina her yek ji wan teoriyan de, gelê Kurd û gelê din ên Îranê bi kolonîya wan dimînin û di vê demê de, serkeftiyê sereke neteweya Fars dibe. Ji bo mînak, şerê di navbera bîrokeya Selteneqxwazan û teoriya Îranşehrî û demokrasîya îslamî û ... hwd tîne gorê ku ti yek ji wan qebareyên hizirî azadiya me şûnda nîne, belkî ji koyletiyê bo melayan tîne veguhestin bo koyletiyê bo foqil girêdayî.

Medyayên derve yên Farsan bi piştvanîya teorîsyenên xwe mejûlî çewtekariyên felsefî ne û herwisa mejûlî guhertina wateya çemkan in. Di medyayên derve ên Farsan de tu ti carî nabînin ku behsa çemka mafê çarenivîsê bê kirin, herçend ku yekek ji bingehen sereke yên carnameya mafê mirov û bingeha azadîxwaziyê ye. Di medyayên derve yên Farsan de, bi hevahengîkirina digel odeyên fikirî yên Spaha Pasdaranê, çemka azadiyê li wateya berfireh a vê qut

dikin û derheq azadiya kinc û azadiya takekesan, tu ticarî nabînin ku behsa azadiyê weke mafeke neteweyên hatinî tepeserkirin, bê kirin.

Em dikarin bêjin ku medyayên Fars li derve, cîbicîkerên planên nerm yên Spaha Quds in. Herdu ji wan beşan yenî Spaha Quds û Opizîsyon û medyayên derve, digel rûhaniyetê arîşe hene. Spah dixwaze dawî biriyardêrê siyasatên derve û navxwe li dest wî de bin, û rûhaniyetê weke emrazekê bo xapandina xelkê bikar bîne. Opozîsyona derve û medya jî, digel rûhaniyetê arîşe hene ji ber ku desthilat li dest de be û xwazyarê kalkirin û nehêlana bandorkirina hizira rûhaniyet û ayînê li ser civakê ye. Bi sedan caran sedan nivîs û helwêstan de, medyayên derve piştvanîya xwe derheq siyasatên Spaha Quds dane xuyakirin û bi hêviya bicihhatina xewna avakirina Pêrşiyaya Noştalojîkaya xwe zanîne û heta wê weke “wêneya mezin” binav dikin. Piştî kuştina “Qasim Solêmanî” tev medyayên derve yên Farsan tazîbar bûn.

Sedema vê yekê ku opizîsyon û medyayên derve, piştvanîya hêzeke terorîstî weke Spaha Pasdaran dikin, ev e ku tenê hêzek e ku di egera hilûşîna Komara Îslamî de dikarin hêvî pê hebin bona vê ku bikarin bi lêdan û îşkencekirin û serkutkirina neteweyan, bi zorê bikin bi Îranî û wan neçar bikin da ku di çarçoveya welatek çekirî de bimînin.

Dema ku di kilozekê de avê dikî nav perdaxekê de, tenê peykera avê tê guhertin, av her hemen av e, cudahiya di navbera ava li derveyê kilozê û ya li nav kilozê de tineye. Dikarin vê avê berdînin di nav sedan modelên din yên perdaxan de û sedan modelên din jî bidî bi avê, lê te`im û bêhna avê nayê guherîn. Ez tu cudahiyekê nabînim, evên ku li derve û li navxwe de weke siyasatvan û medyakar in, her hemû yek cure dîtingeh derheq çemka mafê çarenivîs, azadî û demokrasîyê hene. Her hemû ji wan dema ku behsa mafê çarenivîsê tê gorê, dibin bi hov û tenê alava ku di hizira wan de ye, top û tank û balafir e.

Înternet û Aborî



N: Rehman Selimî

W: Hesen Mukerem

Yek ji wan mijarên ku îro rojê bala xelkê bo aliyê xwe rakêşa ye, pêgeha înternetê di nav aboriya welatan de ye.

Bi qutbûna Înternetê piraniya xizmetguzariyên girêdayê înternetê namînin û piraniya kompaniyayên ku bo birêvebirina karûbarên xwe stuxwarê înternetê ne, yên wek “tirombîlên înternetî, malperên ku di warê piropagen-deyan de çalakiyan encam didin, piraniya çavkaniyan û... hwd”, şiyana bersivdan bi bikerên xwe namîne. Herwisa di warê kar û kasibiyên hûr de jî, piraniya mirovên ku ji rêya “app” û torên civakî ve çalakiyên firotin, banghî û rakişandina bikeran encam didin, rastî ziraran tên. Danûstandina jiyan û aborî di şoreşa pîşeyîya çarem de

Di salên derbasbûyî de, ji ber vegeşîna mifahvergirtin ji înternetê, torên civakî û alavên pêwendigirtinê verçerxaneke bingeîn di xizmetguzariyan, karên pîşeyî û rewşa aboriya cîhanê de pêk hatiye. Torên civakî ên weke “Net û Web” şiyane di warên din de şoreşa zanyariyan pêk bînin û şewazek li şoreşa pîşeyî di girêdana dîcîtal û zanyariyan de biafirîne.

Şoreşa Pîşeyîya çarem pêşkevîna robot û otomasyûnê, zîrekiya destçêkirî, nanoteknolojî, alavên înternetê teknolojiya neuralî (esebî), destkarîkirina gêne û... hwd, çê kiriye ku gihîştandina şewata vê şoreşê ye. Ev şoreşa encama aboriya pêşkevî ya bi awayekî bingeîn guhertiye û li ser kar û pîşeyan, naveroka kar, şewazên emeliyatî yên kar û



kasibiyên û girîngiya bikeran bandor kiriye û heta di şewaza serjimêriya berhemanîna nepaqîjiya navxweyî de jî guherînkariyê pêk aniye. Şoreşa dîcîtalî hemû weke aboriyên mezin ên weke sermayedanîn, bikaranîn, pîşe, bazirganî û aboriya medenî xîstîye bin bandora xwe.

Aboriya dîcîtalî dikare ji “encama çalakiyên aborî û civakî ên li ser girêdana teknolojiyaya zanyariyan û pêwendiyên” bê pênasekirin. Di vê aboriya nû de, torbendiya dîcîtalî û vegeşiyana jêrxanên pêwendigirtinê, di barekê de cîhanê dixemlîne da ku di vir de tak û rêkxistin ji rêya amûran ve digel yekitr reftar hebin, pêwendiyên çê bikin, çalakiyên aborî encam bidin û herwisa alîkarî hebin û li şûna zanyariyan jî bigerin.

Di aboriya dîcîtalî de pêwendî û reftar digel yekitr di çarçêveya înternet û teknolojiyê de gelek girîng e û ev sîstema pêwendigirtinê, bandora herî zêde li ser şêkirin, berhemanîn û xizmetguzariyan hedibe. Her di vê derheqê de, rewşa kar û kasibiyên diguhere û tekinolojiya li şûna vê de amadehiya fîzîkî hedibe. Xizmetkirina bo daxwazkaran bi şeweya neamadebûnê dibe û pişporê wê di bikaranînê de axavtina yekem dike.

Para aboriya dîcîtalî di berhemanîna nepaqîjiya navxweyî de çiqas e?

Aboriya dîcîtalî û çalakiyên di vî warî de yek ji girîntirîn beşên sûdvergirtin û sermayedanîniyê ye ku tenê bi çavlêkirinek bi amarên pênc kompaniyayên serwetir li lîsteya “Fortune”, ên di sala 2018'an de, girîngiya vê rehendê li aboriyê gelek zêdetir ji xwe nîşan dide:

1- Kompaniyaya Apel bi qasî 921 milyar Dolar e

2-Kompaniyaya Amazon bi qasî 765 milyar Dolar e

Google bi qasî 750 milyar Dolar e

Microsoft bi qasî 746 milyar Dolar e

Facebook bi qasî 531 milyar Dolar e

Ev yeka di halekê de ye ku herikîna pereyên wan pênc kompaniyayên mezin nêzîkî 2.2 terlîyon Dolar hatiye texmînkirin. Rastiya vê yekê ev e ku bazirganiya elektronîkî, niha yek ji girîntirîn warên pilandarêtina welatan e û serkevtinê di karê berhemanînê de, dikare rêjeya berhemanîna nepaqîjiya navxweyî bilind bike.

Berhemanîna nepaqîjiya navxweyî ya “Malezya”yê, di warê aboriya dîcîtalî de, pişka %5.13 li xwe digire û ev welata li pey vê yekê ye ku vê rêjeyê bighîjine ji %18. Ev rêjeya bo welatê Koreya Başûr di sala 2016'an de, ji %10.7 bû û li welatê Îranê de ji %99.6 bû, herwisa bo welatê Swêdê ji %82.6 û welatên yekbûyî ên Amerîkayê jî %5.89 li berhemanîna nepaqîjiya navxweyî ye.

Aboriya dîcîtalî û aliyên vê heta astekekê girîng in û li gor rapora rêkxistina cîhanî ya zanyariyan û teknolojiya Amerîkayê, ji %6 li berhemanînên nepaqîjiya navxweyî ya welatên cîhanê li rêya teknolojiya û “ICT” yê tê dabînkirin. Pişka aboriya înternetê jî, di warê berhemanîna nepaqîjiya welatên endam ên li girûpa “G-20” de, 5.5 terlîyon e.

Bajarê Kirmaşan û cugrafiya wî

N: Rojnameya Agirî

Kirmaşan yek ji bajarên mezin ê Rojhilatê Kurdistanê û navenda parêzgeha Kirmaşanê ye. Pêka serhejmariya sala 1395'an a Rojî, heşîmeta wî bajarî nêzik 946,651 kes e. Kirmaşan nehmîn bajarê mezin yê Îranê û herwisa mezintirîn bajarê Rojhilatê Kurdistanê û girîngtirîn bajar li navçeya navendiya rojavayê cugrafiya Îranê ye. Dîroka pêkhatina wî vedigere bo serdema sedsalên çaremîn.

Di heyam şerên yekem û duyem ên cîhanê de, bajarê Kirmaşanê ji aliyê hêzên dagîrkeran ve hatibû dagîrkirin. Lê, piştî bi dawîbûna şer ev der cih hêlan. Herwisa di heyama şerê di navbera Îran û Îraqê de jî, zirarek bêsînor ber ket.

Çiyayê “Feroşad” li bakur, çiyayê “Taqosan” li başûrê Kirmaşanê hilkevtime. Pereştgeha Anahîta, mizgevtî Îmad Dildûlî, kevrê ku li ser hatiye nivîsandin yê Bêsitûnê, Gordximeya Sehne, karwanseraya Şah Ebas, himama Hacî Şehbaz Xan, şikefta Qurî Qela, Îmareta Xusrew, kelha Menîje, gora ser qebra axa, kelha Yezdgerd, Taqî Gera, Gurdexmeya Dukana Davûd, Gordexmeya Îshaqê Vend û... hwd, cihên geştyarî yên parêzgeha Kirmaşanê ne. Bajarê Kirmaşanê xwediyê kêşa hewayek xweş û çiyayî ye, her bi vê sedemê ye ku di berê de li serdema sedsala çaremîn de ku bajareke piçûk bûye, ji aliyê Sasaniyan ve wekî paytexta duyem a împatoriyan hatiye hilbijartin. Her di vê serdemê de bajarê Kirmaşanê bûye cihê xweş derbasiya şahên Sasaniyan û baxçe û koşkên mezin vir hatine avakirin.

Bajarê Kirmaşanê navenda cotyariya Kurdistanê ye û zêdeyî aboriya wî bajarî girêdayê karê cotyariyê ye. Hêjîr, Genim, Tut, Sêv, Silk (çixinder) û... hwd ji berhemên girîng ên wî bajarî tînin hesabkirin.



Bajarê Kirmaşanê di nîveka rêze çiyayên Zagrosê hilkevtime û bi sedema hebûna rewşa çiyayan, xwediyê şikeft û stargehên xwezayî ye û yek ji cihên herî girîng ê jiyana mirov di serdemên berê de bûye.

Xelkê Kirmaşanê, bi devokên weke, Kelhûrî, Erdelanî, Caf, Lekî û Hewramî diaxivin û her weke parêzgehê din ên Kurdistanê, di xwendîngeh û dibistanên wî bajarî de, tenê bi zimanê Farsî ders tê gotin û zimanê Kurdî bo xwendinê qedexe ye.

Dîroka navê Kirmaşanê

Kirmaşan bi dirêjahiya dîrokê xwediyê navên cuda bûye û ev jî, ji ber sedemên guherînê hikûmetan bûye. Yek ji kevtirîn navên wî cihî di serdemê paşayetiya “Kasiyan” de bûye ku bi wê malbendê re “Îlîpiyan” hatiye gotin. Herwisa li serçaveyên serdemên Hexamenîşyan de, bajarek bi navê “Kambadîn” an jî “Kambadneyan” hatiye û li cihê bajarê Kirmaşana niha de bûye. Di serçaveyên serdemên Sasaniyan de jî, ji navên “Kirmînşan” û “Gilmîşen” mifah hatiye vergirtin.

Piştî îslamê, navê bajêr di serçaveyên Erebî de, bi navên weke “Qermasîn” an jî “Qermîsîn” hatiye guhertin lê, piştî derbasbûna çend sedsalan dîsan navên weke “Kirmanşahan” û “Kirmanşah”ê hatiye nivîsîn.

Navê bajêr piştî şoreşa 1357'an a Rojî li Îranê, di destpêkê de guhertin bi “Qehrmanşehr” û piştî derbasbûna heyamekê ew guhertin û bû bi “Baxteran” lê, guhertina nav bû bi sedemê nerazîbûna xelkê bajêr. Di encamê de mecîlsa rejîmê yasayek pejrand ku navê bajêr bibe bi “Kirmaşan”. Li derheq navê Kirmaşanê, dîtingehên cuda hene. Hin kes wisa hesab dikin ku navê bajêr Kirmanşah e û ji naznavê Behramê Çarem hatiye vergirtin ku li serdemê sedsalên sêyem heta çarem a Zayînî de paşayê bajarê Kirman li rojhilatê Îranê ya niha ye, bûye û piştî avakirina bajarê Kirmaşanê navê wî paşayî li ser bajêr hatiye danîn.

Eva di halekê de ye ku xelkê bajar dibêjine zimanê xwe yê Kurdî “Kirmaşan”î. Mihemed Mukrî, Zimanzan û Lêkolerê Kurdî wisa dizane navê Kirmanşah axavtinek şaşî ye û peyva Kirmaşanê bi şaşî cihê xwe girtiye û ji peyva Kirmanç an Kirmanc wate werzêr hatiye hildan û pêka nerîna wî bi wateya bajarê reiyetan e. Mamoştê Hejar di ferhenga “Henbaneborîne” de, peyva Kirmaşan ji rîşeya Kirmanc daye zanî ku bi wateya gundê Kurd e bi nerîna wî peyva Kirmaşan kurtkiriya “Kirmanc bajar yan Kirmancane” ye.

Şarîstaniyetên kevin

Li gor lêkolerên warê şûnwarnasîn û dîroknasan, derbasiya şarîstaniyetê li Kirmaşanê vedigere bo serdemên 8 heta 12 hezar salan berî niha û berevajiyê piraniya cihên din ku tenê di yek serdemê dîrokê de avedan bûne, ev cihe li hemî serdemên dîrokê ên şarîstaniyeta mirov de cihek bo jiyana û şarîstaniyetê bûye.

Bajarê Kirmaşanê li serdemê berê wek deriyê çûne jorê bo Asiyayê ji aliyê Mezopotamiyayê ve bûye. Mezintirîn rêya peywendiyên di navbera navçeyên Îrana niha û herwisa welatê Çîn û Hindûstan digel rûniştîyên Mezopotamiya ku rêya Şahan jê re dihat gotin, li bajarê Kirmaşanê derbas bûye.

Nerîna Lîderan



“John Kirby”:

“Em gefên Îranê û girûpên ser bi wê bi micidî verdigirin û me mafê berevanî ji xwe li hember wan heye”.



“Boris Johnson”:

“Dema danûstandina zîndîkirina Bercamê ber bi dawîpêhatinê ve diçe”.



“Mistefa El-kazimî”:

“Teqeya mûşekan ber bi binkeyên Îraqê ve, karek pûç e û tenê ewlehiya welat li nav hev dide”.



“Selahattin Demirtaş”:

“MHP gav bi gav dawiyê bi AKPyê tîne”.

Kurdpa di 11 saliya xwe de şanaziyên nû diafirîne



N: Eskender Ceiferî

Saziya mafên mirovan a Kurdpa ye ku niha di 11 saliya xwe de ye, bi belavkirina rojane ya nûçeyên girtina welatîyan bi tohmêtên siyasî û belavkirina belgeyan û herwisa çêkirina peywendîyan di asta navdewletî de dibe mînakê ji saziyên xwebexş di asta Kurdiştanê de.

Wek baktirîyan, saziyan ku xwe wek parêzvanên mafên mirovan binav dikin, berfireh bûne. Di vê navberê de piraniya wan, tenê ji bo pere hatibûn avakirin, ji xwe piştevaniya aliyên navdewletî ji bo çalakvanên mafên mirovan jî, bûye sedem ku fikra bazirganiyê berfireh bibe. Bi awayekî ku kesek dirabe û malperekê ava dike, navê wê didanî sazî û ji bo karên xwe, piştevaniya malî jî bi dest dixî e. Lê belê, pêwîst bû saziyên wek Kurdpa, ajar vedin û bibin dengê bînpêkariyên mafên mirovan li Kurdiştana Rojhilat.

Saziya Kurdpa ku, ev 11 sal in çalak e û par li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hate tomarkirin, di daxuyaniya xwe ya avakirinê de ragihand: “Rewşa nebaş a mafên mirovan li navçeyên cuda yên Îranê û kiryarên desthilatdariyê ji bo bînpêkariya zêdetir, berfireh û berdewam a mafên mirovan, bûye sedemeke girîng ji bo avakirina saziyeke mafên mirovan a serbixwe. Ew sazî wê hem nûçe û zanyariyên derbarê wan bînpêkariyan tomar bike û hem jî, bînpêkariyan bişopîne. Saziyeke bi vî rengî, dikare li wan navçeyan ku saziyên din li wêderê çalak nîn in, perwerdehya mafên mirovan danî. Li ser vê bingehe jî Kurdpa wek saziyek ku ne li ser



pêgeha berjewendiyan hatiye avakirin, piştî xwe bi hin rojnamevan û nûçegihanên pêşketî germ dike ku, ji berê ve li hin ji wan navçeyan kar dikin lê belê ew kes hatibûn piştguxistin. Saziya Kurdpa ji aliyê toreke çalakvanan ve ku ji heman navçeyan in, hatiye avakirin.”

Saziya Mafên Mirovan a Kurdpa, sala 2020’an li ser van 3 bingehan, li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatiye tomarkirin û çalakiyên xwe berdewam dike. Lê berî wê jî, ji Yazde salan berî niha ve her çalak bû.

Kurdpa ku ji aliyê şehîd Kawe Cewanmerd ve hatibû avakirin û heya niha jî di çeper û rêbaza wî de ye, bi awayekî xwebexşane ji aliyê kesên dilsoz ve ji bo doza Kurd û mafên mirovan li Kurdiştana Rojhilat bi awayekî bê beramber tê rêvebirin. Vê saziyê di beşeke din ji daxuyaniya xwe de tekez kiriye ku Kurdpa dixwaze kêmasiyan di warê nasandin û ragihandina bînpêkariyên mafên mirovan de qerebû bike û vê valahiyê tijî bike. Li ser vê rêbazê jî 3 xalên sereke hene ku Kurdpa xwe bi wan wefadar dibîne;

Xala yekemîn ev e ku, saziyên mafên mirovan dikevin bin bandora siyasî. Saziya Kurdpa, wek bingeha xwe ya sereke, hewl dide ji bo eşkerekirin û ragihandina bînpêkariyên mafên mirovan, ji siyasîetê dûr be. Di vî warî de Kurdpa dixwaze serxwebûn û pêşketîbûna xwe bi-parêze û dûrî ramanên siyasî be.

Ev sazî, ramana xwe û enerjiya xwe, ji bo parastina mafên mirovan bi kar tîne ku di vê rêbazê de dehan qurbanî jî dane. Ne tenê rêveber û avakerê wê hate şehîdkirin, lê belê bi dehan rojnamevanên Kurdpayê jî çendîn caran ji aliyê dagirkar ve raştî givaşan hatin. Lê, ji bo Kurdpayê, parêzvanîkirin ji mafên mirovan jî her tiştî girîngtir e. Lewma jî, qet bixwe piropagende bi wan nekiriye.

Ji xeynî van du xalan, saziya Kurdpa amaje dide xaleke din a herî girîng ku, derbarê piştraştîkirina zanyariyan e. Eger saziyek, hemû gotegotan wek nûçe belav bike, ne ew sazî dikare bibe cihê baweriyê û ne jî karê rêveberên wê, wek dilsozî tê binavkirin. Kurdpa di beşa dawiyê ya daxuyaniya xwe de dibêje: “Xala sêyemîn jî ev e ku saziya Kurdpa, zanyariyên xwe ji xeynî çavkaniya sereke, ji çavkaniyeke duyem jî piştraşt dike. Em zêdetir di vê derbarê de girîngiyê didin nûçegihan, parêzer û wan çalakvanan ku ji berê ve di vê mijarê de çalak in. Ev pirose, ji bo me baweriyê li pey xwe ve tîne.”

Kurdpa û xebatkarên wê dibêjin heya roja ku bînpêkariya mafên mirovan li Kurdiştanê berdewam bike, ewê jî di karên xwe de berdewam bin. Herqasî jî ku qet piştewaneke madî ya wan tine be û ji aliyê endamên wê ve xwebexşane bê rêvebirin, lê dîsa jî xebata wan li dijî rejîmê pir girîng e ji ber ku beşeke zêde ji wan bînpêkariyan eşkere dikin.

Sûriya ... Herfîna dewletê



N: Ebdûlazîz Qasim

Nêzî 19 salan berî niha, rejîma Be'is ya Îraqê di 09.04.2003'an de, bi yek carî hat helweşandin û bi helweşandina rejîma Sedam, Îraq hem wekî Rejîm û hem jî wekî dewlet, herifî û heta niha jî tevî hemû hewldan-an, ji bo avakirina dewletê li Îraqê de, tiştek wekî dewleteke serûsamankirî, li Îraqa nû de ne xuya ye!

Herwisa li Sûriyayê de jî, ku îro tevî mana rêjîma Be'is li ser desthilatê, lê hevdem tiştek wekî dewlet nemaye, heta ku em di-karin bêjin dewleta Sûriyayê helweşiyaye, û netenê Suriye wekî dewlet helweşiyaye, belkû hatiye dagîrkirin û parçekirin, bi taybet ji aliyê Îran û Tirkiye ve, tevî ku niha hin hewldan ji aliyê dewletên Erebi tîn dîtin, ji bo dubarekirina tîkiliyên dîplomasi û aboriya ligel rejîma Sûriyayê.

Îran û milişên Hizbullahê, pêgehek bihêz di qada Sûriyayê de hene lê, xuya ye ku Îsraîl û Rûsiye jî, li ser wê yekê kar dikin ji bona jî-navbirina rola Îranê ya heyî li Suriye de, bi taybet hebûna wê ya leşkerî û aborî, heta ku ti rola wê di paşeroja Sûriyayê de nemîne, her wekî xuya ye, ji topbarankirina Bendera Lazîqiye ku îro di destê Îranê de ye û di 15 kîlometriya balafîrxaneyê Himemîmê hilkeftiyê û Îsraîlê êrîşa esmanî li dijî pêk aniye. Ligel bîdengiya Rusiyayê, nemaze ku ev Bender di heyama kêmtir ji mehekê de, du caran ji aliyê Îsraîlê ve hate mûşekbarabkirin û ev yek li gorî daxuyaniya şirovekarê siyasî yê Îsraîlê



yê bi navê Yoav Stern ku ji kenala "Alhurra" re hate belav kirin êrîşên Îsraîl yên li dijî Bendera Lazîqiye 3 xalên "giring" diyar dike, yek ji wan: "Îsraîl dawî bi rûbirûbûna hebûna leşkerî ya Îranê li Sûriyayê nayîne û her wekî serokwezîrê Îsraîlê Bennett diyar kirbû, divê dorpêça mûşekî ya ku Îran hewl dide li derdora Îsraîlê çê bike ji holê rake, û xala duyem jî şirovekarê siyasî dibêje: Ev êrîş " li Kûrahiya hevkarîya stratejîk ya di navbera Îsraîl û Rusiyayê de eşkere dike", û Stern dibêje: Xala sêyem nîşan bi wê yekê ye ku Suriye wekî dewlet herifî ye, û Suriye bûye qada şer ya hêzên navxweyî, herêmî û navneteweyî."

Hewldanên Îsraîl û Rûsiye, herwisa destpêkirina tîkiliyên hin dewletên Erebi li gel rêjîma Şamê dikevin di çarçoveyê siyaseta rizgarkirina rejîma Sûriyayê di bin kontrola Îranê de, herwisa ji bo tinekirina rola wê di paşeroja Sûriyayê de.

Tirkiye jî wekî Îranê pêgehek bihêz di nav qada Sûriyayê de heye û biyavek berfireh ji erdê Sûriyayê bi taybet, ji erdê kurdiştana Sûriyayê dagîr dike lê, heta niha li dijî hebûna Tirkiye û dagîrkariya wê ti reaksiyonên cidî, ji aliyê Amerîka, Ewropa, dewletên Erebi, Rusiya û Îsraîlê venehatîne nîşan dan, û Tirkiye di berdewamiya dagîrkariya xwe de, du kartan bikar tîne, karta Opozisyon û çeteyên Sûrî "Îtîlafê" û ji aliyê din hebûna PKKê wekî hincet û bihane ji bo dest-dirêjiya xwe bikar tîne.

her di vê derheqê de, ne tenê rejîma Sûriyayê biryara xwe jidest daye, belkû Opozisyonê jî, biryara xwe jidest daye û di nav şeqama Sûriyayê de jî, opozisyonê Sûriyayê a girêdayî Tirkiye, ti rolek nîştîmanî nîne û bi tenê bûye destek di destê Tirkiye de û ji bo berjewendiyên wê kar dike lê, wekî tê xuyakirin girîngiya wê roj bi roj lawaz dibe û ji daxuyaniya nûnerê taybet yê serokê Rusiyayê de, Alexander Lavrentiev ya derheq Sûriyayê de, li roja Duşemîya borî 27'ê Kanûna Pêşîn a 2021'an de, derbarê destûr û proseya siyasî li Sûriyayê û helwesta Rusiyayê ya derheq pirsê Sûriyayê de diyar dibe, ku piraniya kartên çareseriyê di destê Moscow de ne, û ev yek tê vê wateyê ku wê ti rola opozisyonê Sûriya yê ya girêdayî Tirkiye, di paşeroja Sûriyayê de nabe, û bi tinekirina vê opozisyonê kaxezek girîng ji destê Tirkiye der dikeve.

Lê, wekî kurd derxistina karta du li destê Tirkiye de, ew xalek herî girîng, û ev yek tenê bi riya yekirêziya kurd misoger dibe, ku heta radeyekî ev yek dikeve li ser berpirsyariya Amerîkayê ji bona temamkirina diyaloga kurdî-kurdî û bidestxistina biryarek netewî ya kurd li Rojavayê Kurdistanê de.

Wekî ku xuya ye, Suriye ji aliyê xizmetgozariyên serekî, dem û dezgehên dewletê ve ti nemaye, bi tenê wekî rejîm maye, bi taybetî ku aboriya Sûriyayê rastî wêrankariyek mezin hatiye û îro nirxa lêreya Surî ji 50 lêreyî beramber yek dolarî gihîştîye zêdetir ji 3700 beramber dolar, lewra ku Suriye ketiye di tunêlek tarî de û kirîza wê bi hêsanî û di şev û rojekî de çareser nabe, nemaze ku dewletên Ewropî û Amerîka ji bilî ewlehiya Îsraîlê, ti girîngiya caran bi pirsê Sûriyayê nadin, heta dibe ku bazar li ser Sûriyayê û Ukraine di navbera wan de hatibin pêkanîn, ku îro di pirsê Sûriyayê de, bêtir gerew li ser Rusiyayê dibe, wê çî pêşkêş bike û dikare çî pêşkêş bike û di nav de, çarenivîsa pirsê kurd wê bi çî awayî be nemaze ligel zêdebûna gef û êrîşên Tirkiye û çeteyên wê li dijî maf û hebûna gelê kurd?.

li bajarê Mihabadê 806 dersxwanan bi sedema bê îmkaniyê dev ji xwandinê berdane

Bajarê “Mihabad”ê di îsal de zêdetirîn amara devberdana ji derisxwandinê hebûye, û piraniya wan qutabiyên jî ku dev ji xwandinê berdane, kur bûne, tenê di pola yazdê de rêjeya keçan ji kuran zêdetir bûye.

Pêka gotina berpirsê îdareya Perwerde û Hînkariya bajarê “Mihabad”ê di qonaxa destpêkê de û li serhev di 3ê qonaxên xwandina îsal de, 806 qutabiyên di wî bajarî de desa ji xwendinê kêşane, ku rêjeya wê amarê di gundan de gorekî bajaran kêmtire.

Pêka amarên berdest, di qonaxa xwandina destpêkiya îsal de 23 derisxwan di asta yekem a diwanavendî 43 derisxwan di asta duyem a diwanavendî û 740 derisxwan di wî bajarî de dev ji xwandinê berdan.

Di pola neh de 38 derisxwanên keç û 160 derisxwanên kur, di

pola deh de 121 derisxwan keç û 152 derisxwanên kur û herwisa di pola yazdehem de 148 derisxwanên keç û 121 derisxwanên kur dev ji xwandinê berdane.

Herwisa di qonaxa yekem a diwanavendî 12 derisxwanên keç û 31 derisxwanên kur û di qonaxa destpêkiyê de 12 keç û 11 kur dev ji xwandinê berdane.

Pêka gotina berpirsê îdareya Perwerde û Hînkariya bajarê “Mihabad”ê zêdetirîn amara devberdan ji xwandinê taybete bi deverên derdora bajar ku ji gelek îmkaniyan bêparin.

Nebûna îmkaniyan û destpêrenehîştina piraniya derisxwanan bi emkanatên taybet bi perwerdekirinê wekî, mobayl û teblêtan û herwisa koç kirin û karkirina piraniya derisxwanan tevî malbatên xwe, bûye sedema vê yekê ku piraniya derisxwanan di wî bajarî de dev ji xwandinê berdin.

Kedkarên bajarvaniya Pîranşarê 5 meh e heqdestên xwe vernegirtine



Kedkarên bajarvaniya Pîranşarê bi sedema nedana heqdestên wan yê 5 mehan ji aliyê bajarvaniyê ve rastî pîrsgirêkan hatine û daxwaz ji bajarvanî û Şêwraya bajar kirine ku sozên xwe bi cih bînin.

Pêka nûçeyên belavbûyî yê bajarê Pîranşarê, heqdesta 5 mehan ya kedkarên bajarvaniyê bi wan re nehatiye dan û kedkaran gotine ku her rojê bi hêcetê heqdestên wan ên paşkevî bi wan re nadin û her salê bi hêceta vê yekê ku hisaba bajarvaniyê dayxistî ye, heqdestên kedkaran radigrin û bi wan re nadin.

Kedkarên bajarvaniya Pîranşarê gotine ku nikarin hewcehiyên jiyana xwe dabîn bikin û tevahiya wan kedkaran qerdarê dikanan û nanvaxaneyan in.

Herwisa wan kedkaran daxaz ji bajarvanî û Şêwraya bajar kirine ku sozên xwe bi cih bînin.

Berpirsên rejîmê Îramê, bi taybet di beşên xizmetkariyên wekî bajarvaniyan de, jiyana kedkaran ku hejartirîn qata civaka Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ne jiyana xelkê berçav nagirîn û ti girîngiyek bi pîrsgirêkên kedkaran nadin.

Rêûbanê gundên parêzgeha Îlamê bûne sedema koçkirina rûniştîyên wan



Pêka nûçeyên navxweyî yê belavbûyî, bi sedema girîngîpêndana rejîma Îranê bi rêûbanê gundên parêzgeha Îlamê, beşek zêde ji rûniştîyên gundan bo bajaran koç dikan.

Rewşa xirab a rêûbanê gundên wê parêzgehê bandorek zêde li ser jînavçûna geşeya aborî ya werzêran danaye û rûniştîyên gundan bi hêviya vê ku destê wan bi dahatek û jiyaneke aram bigihe rû li parêzgehên din dikan.

Her salê ku baran dibare rêyên beşek zêde ji gundên wê parêzgehê tene girtin û bi vê sedemê xisarek zêde li pey xwe tîne.

Parêzgeha Îlamê yek ji parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê ye ku di asta Îranê de ji xizmetguzariyan bêpar e û di heyama salên derbasbûyî de bi sedema çaresernekirina kêşê û pîrsgirêkên rûniştîyên gundan, beşek zêde ji hevvelatiyan rû li bajaran kirine.

Gefa jinavçûnê li ser şûnewarên dîrokî yên parêzgeha “Îlam”ê heye

Birêveberê giştî yê Geştiyarî û Pîşeya Deştî yê parêzgeha Îlamê “Ebdulmalik Şenbezade” gotiye: “Bi sedema berbelavbûna wan şûnewarên dîrokî û rewşa topografîya wê parêzgehê û kesên derfetçî, gefa jinavçûnê li sere şûnewarên wê parêzgehê heye.”

Gotinê wî karbidestê rejîmê di halekê deye ku talankirina şûnewarên dîrokî di Kurdistanê de bi tenê ji aliyê kesên ser bi rejîmê û bi armanca jinavbirina dîrok û nasnameya Kurd û Kurdistanê tê encam dan.

Parêzgarê “Îlam”ê di warê pîşeya geştiyarî û hebûna zêrxanên geştiyariyê de, dewlemend e û giringîdan bi wan pîşeyan dikare beşek zêde ji kirîzên aborî û bêkariya welatîyan di wê parêzgehê



de çareser bike.

Parêzgeha “Îlam”ê zêdetir ji 2 hezar şûnewar û cihên balkêş yên dîrokî hene ku dikare bibe cihekê baş bo geştiyarên navxûyî û biyanî.

Bi sedema xemsariya berpirsên pêwendîdar ew cihên dîrokî ji aliyê kesên derfetçî û kesên girêdayê rejîmê ve têne daştîrkirin û tîk dan û di encam de balkêşîya xwe ji deşt diden.

Di sala 2021an de çend pirtûkên Kurdî hatin çapkirin

Hejmara pirtûkên kurdî ku di sala 2021an de hatine çapkirin eşkere bûn. Li gor rapora malpera Diyarname di nava salekê de 365 pirtûk ji hêla weşanxaneyên Kurdî ve hatine çapkirin ku ew li Stenbol, Amed û çend bajarên din in.

Di wê demê de ku qeyrana aborî û zêdebûna nîrxê dolar bandoreke nebaş li vê qadê jî dike weşanxaneyên kurdî di bin zehmetiyek mezin de karê xwe berdewam dikin.

Li gor rapora Diyarnameyê bi giştî 26 weşanxaneyan karê çapkirina pirtûkan berdewam kirine û weşanxaneya ku di sala 2021an de herî zêde pirtûk çapkirine jî JûJ ye. Vê weşanxaneyê di sala 2021an de 20 jê pirtûkên zarokan bi giştî 68 pirtûk çapkirine.

Dûre Weşanên Avesta bi 59 pirtûkan di rêza duyemîn de cih girtiye. Li gor vê reqemê hema bêje ji sisêyan yekê pirtûkên îsal ji aliyê van her du weşanxaneyan ve hatine çapkirin. Di nav pênc



weşanxaneyên pêşî ku zêde pirtûk çap kirine de Peywend bi 33 pirtûkan bûye sêyemîn, Lîs bi 26 pirtûkan bûye 4'emîn û di rêza 5an de du weşanxane hene: Weşanên Nûbihar û Na. Her du weşanxaneyan her yekê 24 pirtûk çap kirine.

Di warê cureyê herî zêde hatine çapkirin de îsal “roman” bûye yekemîn. Ev çend sal bûn herî zêde helbest dihatin çapkirin îsal 77 roman hatine çapkirin ku bi vê ev cure di rêza yekemîn de ye. Dûre helbest tî: 69 heb. Her wiha çîrok jî bi 55 heban di rêza

sêyemîn de cih girtiye. Di vê em bêjin her pirtûkek zarokan jî me wekî pirtûkek hesaband ku îsal ji bo zarokan jî gelek pirtûk hatine çapkirin.

Di warê nivîskarên zêde derketine pêş de hin nav hene ku divê em li vir bibîr bixin: Kerem Tekoglu 20 pirtûkên zarokan çap kirine. Tekoglu navê “Çîrokên Gule” li setê kiriye û çîrok ji Weşanên J&J derketine. Hîlmî Akyolê ku her sal xebatên xwe yên berhevkarîyê pêşkêş dike îsal 12 pirtûkên berhevkarîyê, yên li ser zargotina kurdî pêşkêş kirine. Ji van pirtûkan

6 jê pirtûkên Antolojiya Dengbêjên Amedê ne. Xebata Akyol jî ji J&J'yê derketiye.

Kemal Tolan li ser êzdayetî 6 pirtûk (Weşanên Na) amade û weşandine. Dîsa ji nivîskaran Fawaz Husên bi pirtûka xwe û bi wergerên xwe, bi 6 pirtûkan (Weşanên Avesta) ketiye nava kesên vê rêzê.

Ev hemû bi kurmancî ne û di warê kirmancî (zazakî) de Elî Çîçek (Enstîtuya Kurdî) û Evdî Hesqera (Weşanên Roşa) her yek bi 2 pirtûkan ked daye zazakî. Ç: RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirovî di Kurdistabnê de

Amara 10 sale ya kuştin û birîndarbûna kolberan di Kurdistanê de
18:14 - 3 Kanûna Paşîn 2022
Navenda Amarî ya Saziya
Mafê Mirovî ya “Kurdpa”yê,
xiştêya amarî ya 10 sale
(2012 heta 2021an) ya kuştin
û birîndarbûna kolberan di
Kurdistanê de belav kir.

Kurtiyek ji vê raporê bi vî
awayî ye:

Ji sala 2012an heta 2021an
bi giştî 1590 kolber hatine
kuştin û birîndarkirin. (515
kuştî û 1075 birîndar)
29 kes ji wan kolberên ku
hatinê kuştin û birîndarkirin
temenê wan di bin 18 saliyê
de ye.

Zêdetir 76% ji wan kolberan
bi sedema teqeya hêzên
leşkerî yên Komara Îslamî
ya Îranê hatine kuştin û
birîndarkirin.

Kuştin û birîndarbûn bi
sedema kevîtin ji bilindahiy-
yan ve ji 7%; bi sedema sir
û seqem û reniyê 6%; bi
sedema teqîna mîn jî 5%;
Ev ji gelempera girîngtirîn
sedemên kuştin û birîndar-
bûna kolberan bûn.

Amara kuştî û birîndarbûna
kolberan li salên (2012an
heta 2021an)

Di vê amarê de, bi cudakirina
salan (ji destpêka sala 2012an
heya dawî roja sala 2021an),
hejmara kuştî û birîndarbûy-
an hatiye:

Sala 2012an:

Hejmar: 73 halet
Kuştî: 44 halet
Birîndar: 29 halet
Çawahiya kuştî û birîndar-
bûna kolberan:
Teqeya raşteraşt a hêzên
leşkerî yên Îranê: 63 halet
Bi sedema reniyê: 6 halet
Teqîna mîn: 3 halet
Nexuya: 1 halet
Kuştî û birîndarbûna kol-
berên bin 18 saliyê:
Kuştina zarokek 17 sal

Sala 2013an:

Hejmar: 92 halet
Kuştî: 38
Birîndar: 54
Çawahiya kuştî û birîndar-
bûn:

Teqeya raşteraşt a hêzên
leşkerî yên Îranê: 71 halet
Bi sedema reniyê: 7 halet
Kevîtin ji bilindahiyen ve: 3
halet
Teqîna mîn: 7 halet
Sekîna dil di bin barê
kolberiyê de: 2 halet
Kuştin û birîndarbûn bi
sedema bûyerên hatûçûnê: 1
halet
Kevîtin di nav kanalên sînori
de: 1 halet
Kuştî û birîndarbûna kol-
berên di bin 18 saliyê de:
6 zarok (4 kuştî û 2 birîndar)

Sala 2014an

Hejmar: 89 halet
Kuştî: 34 halet
Birîndar: 55 halet
Çawahiya kuştî û birîndar-
bûna kolberan:
Teqeya raşteraşt a hêzên
leşkerî yên Îranê: 71 halet
Bi sedema reniyê: 7 halet
Teqîna mîn: 6 halet
Kevîtin bo nav çem: 2 halet
Givaş bi sedema kolberiyê: 1
halet
Lêdan û kutan ji aliyê hêzên
leşkerî ve: 1 halet
Kuştin û birîndarbûn bi
sedema bûyerên hatûçûnê: 11
halet
Kuştî û birîndarbûna kol-
berên di bin 18 saliyê de:
Kuştina zarokek 17 sal

Sala 2015

Hejmar: 72 halet
Kuştî: 42 halet
Birîndar: 30 halet
Çawahiya kuştî û birîndar-
bûna kolberan
Teqeya raşteraşt a hêzên
leşkerî yên Îranê: 62 halet
Bi sedema renî û sir û seqem:
2 halet
Kevîtin ji bilindahiyen ve: 3
halet
Kevîtin bo nav çem: 2 halet
Teqîna mîn: 3 halet
Kuştî û birîndarbûna kol-
berên jêr 18 salî
Kuştina 2 zarokên 17 salî

Sala 2016

Hejmar: 122 halet
Kuştî: 51 halet
Birîndar: 71 halet
Çawahiya kuştin û birîndar-
bûna kolberan:
Teqeya raşteraşt a hêzên
leşkerî yên Îranê: 96 halet

Bi sedema reniyê: 2 halet
Kevîtin ji bilindahiyen ve: 3
halet
Kevîtin di nav çem de: 2 halet
Teqîna mîn: 4 halet
Sekîna dil di dema kolberi-
yê de: 1 halet
Kuştin û birîndarbûn bi
sedema bûyerên hatûçûnê: 13
halet
Givaş bi sedema kolberiyê: 1
halet
Kuştî û birîndarbûna kol-
berên jêr 18 salî
2 kuştî û birîndarbûn (kuştina
zarokek û birîndarbûna
zarokek temen 16 salî)

Sala 2017an

Hejmar: 220 halet
Kuştî: 65 halet
Birîndar: 153
Bê serûşûn: 2 halet
Çawahiya kuştî û birîndar-
bûna kolberan:
Teqeya raşteraşt a hêzên
leşkerî yên Îranê: 132 halet
Bi sedema renî û sir û seqem:
20 halet
Kevîtin ji bilindahiyen ve: 19
halet
Lêdan û kutan ji aliyê hêzên
leşkerî ve: 1 halet
Gazgirtin kolberên nav xîvetê
û di dema kolberiyê de: 1
halet
Teqîna mîn: 9 halet
Sekîna dil di dema kolberi-
yê de: 3 halet
Bê serûşûn: 2 halet
Kuştin û birîndarbûn bi
sedema bûyerên hatûçûnê: 33
halet
Kuştî û birîndarbûna kol-
berên temen 18 salî
4 (kuştina 3 zarokên 16,
13 û 17 salî û birîndarbûna
zarokek 16 salî)

Sala 2018an:

Hejmar: 228 halet
Kuştî: 70 halet
Birîndar: 158
Çawahiya kuştî û birîndar-
bûna kolberan
Teqeya raşteraşt a hêzên
leşkerî yên Îranê: 148 halet
Bi sedema reniyê: 12 halet
Kevîtin ji bilindahiyen ve: 23
halet
Kevîtin di nav çem de: 2 halet
Teqîna mîn: 23 halet
Qutbûna riha piştê di dema
kolberiyê de: 1 halet
Sekîna dil di dema kolberi-
yê de: 3 halet
Kevîtin bar bi ser kolberan:
1 halet
Êriş û lêdan û kutana kol-

beran ji aliyê hêzên leşkerî
ve: 1 halet
Kuştin û birîndarbûn bi
sedema bûyerên hatûçûnê: 14
halet
Kuştî û birîndarbûna kol-
berên jêr 18 salî
Birîndarbûna 2 zarokên 15
salî

Sala 2019an

Hejmar: 250 halet
Kuştî: 70 halet
Birîndar: 180 halet
Çawahiya kuştî û birîndar-
bûna kolberan:
Teqeya raşteraşt a hêzên
leşkerî yên Îranê: 199 halet
Bi sedema renî û sir û seqem:
15 halet
Kevîtin ji bilindahiyen ve: 18
halet
Lêdan û kutan ji aliyê hêzên
leşkerî ve: 3 halet
Kevîtin di nav çem de: 4 halet
Teqîna mîn: 8 halet
Sekîna dil di dema kolberi-
yê de: 2 halet
Kuştin û birîndarbûn bi
sedema bûyerên hatûçûnê: 1
halet
Kuştî û birîndarbûna kol-
berên jêr 18 salî
6 nûciwanên 14 heta 17
salî ji wan Ferhad Xusrewî
zarokê temen 14 salî ku bi
sedema sirê req bû.

Sala 2020an:

Kolberên kuştî û birîndar:
Hejmar: 236 halet
Kuştî: 53 halet
Birîndar: 183
Çawahiya kuştî û birîndar-
bûna kolberan:
Teqeya raşteraşt a hêzên
leşkerî yên Îranê: 199 halet
Bi sedema reniyê: 6 halet
Teqeya hêzên leşkerî yên
Tirkîyê: 17 halet
Kevîtin ji bilindahiyen ve: 12
halet
Lêdan û kutana wann ji aliyê
hêzên leşkerî ve: 4 halet
Kevîtin di nav çem de: 2 halet
Teqîna mîn: 4 halet
Nexuya: 1 halet
Kuştin û birîndarbûn bi
sedema bûyerên hatûçûnê: 19
halet
Kuştî û birîndarbûna kol-
berên jêr 18 salî
Birîndarbûna 4 zarokên te-
men 14 heta 17 salî

Sala 2021an

Kolberên kuştî û birîndar:
Hejmara giştî: 208 halet
Kuştî: 46 halet
Birîndar: 162 halet

ZARAYA NÎŞTIMAN

Parêzera Ziman

